

dabaş

PÎROZ BE

Meha Adarê di dîroka Kurd û Kurdistanê de cihêkî teybetî digire. Sedema vê teybetiyê cejna Newrozê ye, ku bi pîrozbahiyek mezin û daxwazek giştî yê serketina serbestî û azadiyê tê pîroz kirin. Her dem, di daxwazên dozê de, Kawayê Hesinker û agirê wî dibe ala gei. Agirê geş û pêketî her û her di jiyana Kurdan de pîrozbahî ye. Ocax e!.. Berdewama jiyane ye... Zerdestê Kal, bîr û baweriya xwe ya paqij, zelal û têr mirovanî li ser vê bîngêhê ava kiriye. Li ser ruyê cihanê her tiştî, guhertin û tevliheviyê dîtiye. Bilî agir!.. Di nava civaka Kurdan de ku parêzgehiya agir bû ye karbendiya Pîran jî ev e. Yan jî, ew tifika ku her û her bi pereng û pîzot dimîne ye. Tiştêkî din heye: **Newroz**, ne maye mîna cejna kêfxweşî û dîlana rojekê yan du rojan. Di encama îro de û di bûyer û çalakîyên li ber civata Kurd ku ketiye qonaxa pîr nazik de, bû ye evîndariya karûbar û xebatê. Karûbarê bersiva daxwaza gel û hewceyiya hemdemî... **Kawayê Hesinker**, ji bo daxwaz û hewceyiya gelê Kurd, di dema xwe de, ev agirê hana pêxistiye. Kesên ku ev armanc dane ber himbêza xwe jî, bi vê adxwazê, rimî û pêtên vî agirî gur kirine. Ew pêşmalka rengîn bo vê daxwaz û hewceyiya hildane. **Newroz**, bilî cejna neteweyî, bû ye nasnameya Kurdan... Lewra jî her sazî, komele û rêxistina Kurdî xwe pêwîstî pîroz kirina vê cejnê dibîne. Mixabin, di nava civata Kurdan li derveyî welat de, hinek kes hene ku xwe di ser her tiştî re dibînin. Guhertin, pêşketin, tevger di nava mêjiyê wan de cih nagire... Keçeliya serê xwe nabînin, destên xwe bi bi deqa serê xelkê ve dikin. Nizanin ku li hember tevger û guhertina koman malê sifir in, pûç in. Tevger û guhertina koman dişibihe ava liherik. Birk nikarin vê hêzê bidin rawestandî. Kes xwe ne xapîne...Yeke dîn: Hewceyiya gelê Kurd bi koma nivîskaran, bi koma zanyaran, bi koma rojnamevanan, bi koma politikzanan, bi koma lêkolînavan û hwd. heye... Hêza mezin ev e. Karbendiya saziyan pişgiriya van koman e. Sazî, dergehên wilo ne, ne cihê xap û rîpa ne. Netewe bûn gavavêtina ber bi welat e, ne xwe dîrxistina rûhê Kurdî ye... **Kawayê Hesinker**, agir ji bo gelê Kurd pêxist, Kawayên hemdemî jî divê vî agirî ji bo Kurd û Kurdistanê geş bikin...Nirxandina Newrozê û pîrozbahiya cejna Newrozê di vir de ye. **Newroz**, li gelên Kurdistan pîroz be.

Medenî FERHO

ENSTITUYÊ
NAME JI SEROK KOMARA
TIIRKIYÊ RE ŞAND

Hêrişên dewleta Tirkîyê, hember rewşenbîr, nivîskar û demokran bi xurtî berdewam dike. Ev bûyerên ne mirovanî, bala cihanê û nivîskar, rewşenbîr û saziyên Kurd li derveyî welat dikşîne. Teva bédiliya xwe diyar dikin û tewanbariya dewleta Tirkîyê, bi hêz daxuyan dikin. Piştî girtina **Melik FIRAT** û nivîskarê navdar **Yaşar KEMAL** jî hate cezakirin, serokê Enstituyê **Derwêş M. FERHO** nameyek teybetî li ser rewşenbîr, nivîskar û parlementer û politikvanên Kurd ku di girtîgehê de ne, ji Serokomara Tirkîyê re şand. Gotinên ku Serokomare berî niha bi çend salan kiribûn, "nasîna rastiya Kurdî" anî bîra wî û bo bersivdanê bal kişande ser rewşa komên xelkê û bêzariya wan. Bilî vê, di namê de ayan kir ku kesên mîna **Ismail BEŞİKÇİ** û merivên zanyar ku bi salan e di girtîgehê de, bo dewleta Tirkîyê rûşeyîyek mezin e. Hemdema demokrasî û qonaxa ku merovatî tê de, van nexweşiyên li Tirkîyê bi rexne kirinek gunehkarî datîne meydanê. **Derwêş M. FERHO** bal kişande ser pêwîstiya aşîf û gavavêtinên mirovatî û got: **Bersivdana şer rawestandinê wê bibe gavên aşîf û rakirina şikestîkên navbera gelên Tirkîyê**" Name bi hêvîdariya gavavêtinên hemdemî û merovatî ji teref berpîrsiyar û serokên Tirk û heyjêhebûna merovên demokrat û aşîtxwazên cihanê ji bûyerên ne merovatî li Tirkîyê, dawî dibû.

ENSTITUYÊ NEWROZ PÎROZ KIR

Meha Adarê ji bo Enstituyê bû meheke tijî agahdarî, şahî, muzîk, govend û stran. Ji destpêka mehê ve semînerên balkêş dibin. Her roj pîrs ji bo semîneran zêdetir dibe. Bi hevkarîya V.I.C. (Navendiya Navneteweyî ya Flaman) û Komika Flaman li Dendermonde şeveke agahdarî û şahiyê hate çê kirin. Dengbêjên hêja **TEMO**, **Xêro ABBAS**, **SERWAN** û **ŞÊRGO** tev koma govendê di 15ê Adarê de şev şah kirin. Di 16ê Adarê de ji cejna **Newroz** bi eynî dengbêjan hat pîroz kirin. Paş balkêşiya serokê Enstituyê ji bo yekitiya Kurdan û rûhê kurdî ji bo menfaetê Kurdî, rojnamevan û nivîskar **Wezirê EŞO** axaftinek dirêj û balkêş kir. Wî di axaftina xwe de behsa agirê **Kawayê Hesinker** û **berxwedana îro û hêviya serketinê kir**. Kêmasiya koma folklorê xuya dikir lê dîsa şev wek dil dixwest derbas bû. Di roja 23ê Adarê de ji bi alîkariya serokê şahredariya Herent cejna **Newrozê** hate pîroz kirin

BULENT YALÇIN (SERTAC)
LI SER KOMPUTER Û KLAVIYA
KURDÎ SEMÎNER DA

Yek ji semînera meha adarê ku balkêş bû, ya **M. Bulent YALÇIN**, li ser komputer û klaviya Kurdî hat dayin bû. Di nav civaka Kurdî de yekemîn car e ku li ser komputerê û semînerê çê dibe. **YALÇIN**, muhendîsê komputer e û bi salan e li ser komputer kar dike û di hêla klaviya Kurdî de lêkolîn û lêgerînan dike... Ku di vê semînerê de ji xeynî dîroka daktîlo û hunerê komputer û şîrovekirina hember mêjî û çavên merovan, li ser alfabeya Kurdî rawestiya û bala beşdaran kişande lêkolîna **Mîr Celadet BEDIRXAN** û vir de. Got ku: *'Ku di sala 1932 an de lêkolîna li ser alfabeya Kurdî û pîtên Kurdî, ne bi xurtî be jî, îro jî ti kesî ne kiriye û hewqas kesên pesnên xwe didin hene mixabin ji bo vî karî lêkolînek xurt ne kirine. Piştî vê rexne diyar kir ku, ji bo alfabeya Kurdî ji xeynî pîta 'ş' klaviya latînî ya herî nêzîk e...Di vê hêlê de Dr. Ismet Şerîf WANLY, li gorî baweriya min rast difikire.* Paşre bal kişande ser klaviyên cihanê û dîroka daktîlo, bi hinek mînakên jî, hejmara klaviyên alfabeyan da, li ser klaviyên ku ji bo tîp, ji bo leşkerî, ji bo karûbarê rojane hatine amade kirin teva jimartin. Û got ku *'Sala 1808 an, ji bo koran klaviye hatiye çê kirin, mixabin ji bo çil milyon Kurdên bi çav, klaviye ne hatiye çê kirin.* **M. Bulent YALÇIN**, li ser girîngiya klaviye û di guhertin û nujeniya koman de û tevgera neteweyî di rola daktîlo anî ziman û got: *'Daktîlo tiştêkî dîrokî ye û di tevgera neteweyî de rolek mezin lîtiye. Ziman dike yek, alfabe dike yek. Em dikarin bi navê Enstituyek neteweyî jî bi nav bikin. Bilî vê bûye sedema pêşdeçûna ramanan...'* **M. Bulent YALÇIN**, gotin anî ser rola daktîlo di jiyana jinan û bala beşdaran kişand ku vê mekîna piçûk di vê hêlê de şoreş kiriye. *Jin ji hundirû derxistine û kirine şirikê jiy'ana karûbar...'* Ji hêla din ve, gotin anî ser rola daktîlo di pêşdeçûna ramanan û pirtûkan. Dawî mînak anî ser karbendiya daktîlo di xizmeta bazirganiyê û weha got: *'Sîstema zanistî kete xizmeta bazirganiyê de... Karûbar bi lez û rêkûpêk di nava komên xelkê de hate kirin.* Yek ji pêşniyaz û pîrsên wî û guhdaran ew bû ku di nava çarçewa xebata Enstituyê de xebatek li ser vê batedê bê amade kirin. Xebatek xisûsî li ser hînbûna deqtilo, li ser bikaranîna komputer û program û guhertinên hemdemî yek ji pîrsên pêşiya me ne û divê em li ser vê yekê kûr bifikirin.

... Û HWD.

Kerîm BAQUSTANÎ

Hola rewşenbîriya Kurdî -di piralî û babedên xwe de- serrû ye, tevlihev e, ne ghişti ye û tev mij û moran e. Berhem û pirtûkên hêja û ne hêja qabgirtî ne. Ne ji ber ku di naverokên xwe de qels û lewaz in û ne ku di avahiya xwe de xav û ne bijartî ne. Ango sedem ne pirsgirêka rexne û rexnegiriyê ye. Ji bilî ku ev ya dawî pêwîstiya xwe bi xurtî tîne meydanê.

Kurd wek hemû neteweyên Rojhilata Navîn ji bawa xwendin û profesyonelîzmên cure cure bê par in. Encam û jêderiyên vê jî dikşin hinav û hişmendiya civatî û zanistî.

Hişmendiya civatî tê hejmartin wek yek ji refleksiyonên jiyân û qonaxa niştîmanî yên bi teybetî merov û saziyên çand û huner û politîk dixin bin berpirsiyariya pêwîstiya ronasek fireh û ghişti.

Pêwîstiya ku di van çalakî û kar û xebat de ew e ku aktîvtirîn bibin. Saziyên serdar û roldar ku xwedî berpirsiyariyek mezin in di forma niştîmanî û çarçewa rexne û nirxan de, ewê posîdeyên girîng di hişmendî û mentalîta çandî-civatî de bike encamên xwe de.

Pirsgirêka zanistîya teorî û realîte kirina wê, bi giştî, di pêvajokek teng de -car caran- diçe. Ji ber ku rewşenbîr wek sernavekî girêda ye bi jiyân û realîtê ve di gelek mijaran de diyar nebû ye.

Di vê lez û bezê de naxwazim li ber gelek pirsên serekî rawestim. Pirsên jê çû yî ne lê dîsan bi bersivên ghişti û berdawî nebûne.

Rewşenbîrî çî ye û rewşenbîr kî ye? Pevgirêdanên yekemîn di tora zanistî û netewî de (mijara tabloya çargoşeyên gewr û reş). Tuximên wêjeyî gihane kîder? "Rewşenbîriya metafîzîk" û ya realîte. Bandora rexnegiriyê di pêvajoka dîrokî û îroyîn de. Metodên cuda kirina avahiyên ziman û naverokên hundurîn ji ajanên biyanî. Rexnevanî di çarçewên ronasek de. Duruyiya çand û politîk di aheng û jêvên xwe de... û hwd.

SEMÎNER BI PÎROZBAHIYA NEWROZÊ

Di roja 22ê Adarê de, paş semînera Wezîrê Eşo, li ser dîroka Kurdên Sovyetîstana kevin, beşdaran cejna Newrozê di nav xwe de pîroz kirin. Ozanên ezîz û qedirbilind Şivan Perwer û Temelî jî bi saz û stranên xwe reng dane wê pîrozahiyê. Hêvî ew e ku li her derî û di her demê de kurdê me cejnên xwe bi dilxweşî û azad pîroz bike.

Sê mehan carekê, bi agahdarî re, ji xeynî babedên li ser çapemeniya Kurdî, emê rojnameyek 4 rûpelî li ser muzîka Kurdî biweşînin. Berpirsiyariya wê ewê beşa huner û muzîkê bigre ser xwe. Ji muzîka klasîk heya muzîka hemdemî, ekol û awazên nûjen ewê bêne munaqeshe kirin. Her weha stran, peyvok, dîlok û dilojarên kevn jî bi nota di bernamê de hene.

Mîna her hêlan di vê hêlê de jî kêmasî hene. Bi hêviya destpêk û bersiva hin pirsan û babedan û bi hêviya dagirtina valahiya vî mijarî ev gavek e girîng e.

Bi serkêşiya Şêrgo, Xêro û Serwan xebat ji bo damezrandina koma muzîkê dibe.

SEMÎNERÊN LI ENSTITUYÊ BERDEWAM IN

Ev bû demek ku Enstitu xebatek pirralî dike. Di nav çarçewa destûra Enstituyê de li nav xaniyê Enstituyê û li pîrraniya bajarên Beljîka semîner li ser babedên cihê, bi pîrranî li ser Kurd û Kurdistan, tîne amade kirin.

Kursên zimanên cihê, Kurdî, Flamanî û Frensîzî jî dom dikin.

Girîngî û pêwîstiya van semîner û kursan ji pirs û beşdariya kesan baş tê xuya kirin.

Di mehên pêş me de jî ewê ev semîner û kurs berdeyam bikin. Giraniya babedên van semîneran ewê çîrok, roman, helbest û mîzaha Kurdî, nivîskar, helbestvan, zimanzan, ressam, ozan û şexsiyetên din yên Kurdan bin.

Di pêşerojê jî ewê Enstitu li ser babedên mîna komele, komeleyetî, partî, rêxistinên çandî, cihêbûnên di navbera wan de, armancên wan û destûrên wan, rewşenbîr û berhemên wan semîneran amade bike.

Armanc ew e ku em xwe bi xwe, hebûn û pirsên xwe, rastî û pêwîstiyên xwe bi awakî fereh nas bikin. Ji civaka ne kurd re jî nasandina van babedên jor pêwîst e. Li ser çapemeniyê jî ewê semînerên agahdariyê bêne amade kirin.

AMADE KIRINA KURSÊN ÎNFORMATÎKA

Ji sedema pîrsa kesan Enstitu li ser babeda kursên înfomatîka dixebite. Armanc ew e ku Sertac, dersdar û zanayê komputer, di nav çarçewa xebata Enstituyê de kurseke hînkirina bikaranîna û program kirina komputer bide ji bo kesên dixwazin bi awayekî xurt hîn bibin. Di dema temambûna komeke ku vê kursê dixwazê de ders dest pê dikin. Kurs ji her kesî re vekirî ye.

MUZÎK Î FOLKLORA KURDÎ

Zozan OZMANIYAN

Pirsgirêka yekem ya di hemû mijarên Kurdzanyariyê de ew e ku îro kadroyên profesyonel pîrr kêman in. Bi teybetî di warê folklorî muzîkî de weke lêkolînan û lêgervan gelekî kemtir in û ne li ber çawa ne. Ev bi xwe jî encaman dide ku ev mijarê girîng paşguh dibe û ji lêpîrsîn û lêkolînan bê par dimîne. Ta roja îroyîn em bi tenê bi sê çalakîyên di vî warî de dizanin.

1. Lêkolîna Muzaferê Huseynî di sedsalên navîn de ku li gor agahdariya kovara 'Roja Nû' niha li Tirkiyê xelexelexe tê weşandin.

2. Lêkolîna Komîtas (zanyarê muzîka Ermenî) yê ku li Berlînê xwendina xwe di vê sedsala dawîn de qedand. Wî lêkolîneke balkêş li ser folklorî muzîkî ya Kurdî çê kir. Lê mixabin ev berhemên wisa giranbiha bê şop û bê bintor ma. Em nizanin jî bê ka ev berhem çima û çawa wînda bû.

3. Lêkolîn û çend gotarên Nûra Cewarî yên ku li Êrîvanê hatin weşandin.

Ew berhem di salên heftê de hatin weşandin.

Diyar e ku her sê lêkolîn bi teybetî li ser folklorî muzîkî ya kurdên kurman ku li Kurdistanê Bakur û Yekitiya Sovyeta berê dijîn. Lê pêwîstiya ku xwe tîne holê ew e ku lêkolîn û lêgerînêweha divê li beşên Kurdistanê bên kirin û li ser hemû rêxistinên di civata Kurdî de ji bilî vê yekê pirsgirêkên di derheqa folklorî Kurdî de yên ku bi asteng û dijwariyan de mane. Divê têkevin bin çavan û nîrx bibin.:

Ji alî nêrînên ku her mijar bi giştî divê derbasî lêkolînan bibe. Pêwîst e ku hunerê gelerî jî bi firehî û kurayîya xwe bi vî awayî bistîne. Ango, ne dirust e ku girêk û pevgerêdanên mijarekî ji hinerê gel bi cudahiyeke teng lêkolîn bibe.

Di derveyê reaksiyon û danûstendinên di navbera beşên folklor (muzîk, peyv û serpehatiyên gel, livîn û tevgerên hunerî, cil, çîrîzok û resmên sembola ... û hwd.

Ji bo xistina hemû alî û mijarên folklor bin çav û lêgerîn bi awayên pespo û profesyonel ku xweşikû û spehîbûna xwe pêk bîne. Yek ji mînanan ew e ku zanyariya muzîkî bi tenê ji bo lêkolînekê li ser muzîka ne bes e.

Li cem wê divê têgihîştin û zanyariyêke giştî di babed û aliyên din de (dîrok, coğrafya, psikoloji, sosyoloji, etnografi, filoloji û zimanzanî (linguistik) û hwd.

dewam dike

Di sala 1980 de, tiyatroya Kurdan li Tbilîsê bi pirr dijiwariyan hate ava kirin. Lîstikên ku di nav salên cihê de hatin lîstin û afirandin, divê ku ne gelek bin jî, lê li gorî wan şertan ku pirr dijiwar bûn, di xebata xwe de gihane xwedî rûmet. Cara pêşîn bû ku perdeya lîstikên tiyatroyê hatin kişandin û cara yekem bû ku xelkê zimanê welatê xwe li ciyekî dûr di huner de dibihîst. Şahî û dixweşî jî hêlekê ve û tirs û hasret û kul û derd ji hêla din ve girte nav dilê xelkê. Ti kesî nizanibû kîjan hêl zêdetir li ber xwe dikeve; Xelk yan lîstikvan! Di hêla ma'newî de her du alî jî ketin bin tesîreke xurt. **Sinco Qîza Xwe Dide Mêr (Eskerê Boyik)** lîstika yekemîn bû. Weke li nav her rêxistineke çandî de pirsên profesyonelîzmî derketin. Gelek kes ji bo tiyatroyê hebûn lê ne her kes ji bo wî karî xwedî tecrûbe bû. Pirr caran lîstikvan dihatin bijartin lê rola profesyonelî nîkarîbûn bikin. Di aliyê jinan de jî problem hebûn. Dê, bav û mêrên wan qebûl ne dikir ku ew di tiyatroyê de bilîzin. Di nav eynî salê de, pirsên mezin hêdî hêdî hatin çareser kirin. Piyesa duwemîn ya bi navê **Cîran (Georgî Hugayev)** jî lîstin. Piştî wê piyesa bi navê **Siyamend û Xecê (Ayik Beylêriyan, werger Tosinê Reşîd)** bi motîvên folklorê Kurdî hate lîstin. Vê piyêsê li ser xelkê tesîreke gelekî mezin kir. Û her roja diçû xelkê Kurd li Tbilîsê zêdetir li lîstik û xebata tiyatroya Kurdî digera. Bê goman di hemî xebatê de, herweha di nav lîstikvan de jî, hin kêmasî hebûn. Lê dîsanê ev înisyatîf gaveke pirr mezin bû. Bi hemû dijiwariyan ve "Têatra Kurdî" serê her sê-çar mehan piyesek nuh ji xelkê re pêşkêş dikir. Yek ji piyêsên herî naskirî **Xesû (M. Şamxalov)** ye. Hêz û mezinbûna wê lîstikê gelekî hêsa ye: ew komedî pirr nêzî dilê xelkê bû, xelkê jiyana xwe di nav wê piyêsê de dît. Ev rastî, yek ji armancên tiyatroyê bû ku aded û jiyana Kurdan di xebata xwe de bide jiyandin. Pirraniya lîstikvanan di destpêkê de zimanê Kurdî jî ne pirr baş dizanîn. Lê paş demekê ev pirs ji xwe re çareser dibû. Ji ber ku rûhê Kurdî di nava xebat û armancên wê tiyatroyê de hebûn. Ev yek jî mezinbûna wê komika lîstikvanan dide xuya kirin.

Mirazê Uso Cewerî (berpirsiyarê tiyatroyê). Lîstikvan: **Gulçara Usiv Cewerî, Ter-Mînasyan Şamîr Surenovîç, Kufîlka Aso Çildergûşî, Besa Mamed Acemova, Almaza Cimşîd Mamoyî, Înga Torin Kasoyan, Şafikoyê Miraz Cangoyî, Titalê Evdo Gisoyî, Şîrnê Emo Baravî, Têmurê Keleş Çildergûşî, Keremê Miraz Kalandarî, Binbaşê Axê Çildergûşî, Şafikoyê Safo Mistoyî, Elîkê Şêraz Arabov, Îsmailê Usiv Sardarov, Aramê Miraz Balakarî, Casimê Wezîr Osmanov**, berpirsiyarê dekorê **Nuralan Romanê Graçîk**. Hin ji lîstikên wê tiyatroyê: **Zarîna Çîyan, Siyabend û Xecê, Sinco Qîza Xwe Dide Mêr, Xesû, Heta Erbe Nehate Qulibandin, Çiqîlê Darê, Mala Mîn Ne Mala Te Ye, Ji Sisiya Heta Şeşan, Zavayê Xerîb, Zavayê Xerîb, Zarîna Çîyan.**

"QURANA PÎROZ Û ARŞA WÊYE BILIND" DI ZIMANÊ KURDÎ DE

Lêkolînvan û nivîskarê Kurd **Abdullah Varli** Qur'an wergerande zimanê Kurdî. Wek tê zanîn Qur'an ta niha ji bo zimanê Kurdî ne hatiye wergerandin. Li nav civaka me ya Kurdî wergera Qur'anê gunehkî gelekî mezin dihate dîtin. Lê mamoste **Abdullah Varli** ev astenga di nav civata me de hilanî û rê dide gel ku bi zanin ka di Qur'anê de çi hatiye nivîsin. Heta roja îro, gelê Kurd ji devê mele, şêx û mirîdên wan dibihîstin ka çi di Qur'anê de tê gotin. Naveroka wê ji devê wan dîndarên xwedî terfî dihate wergerandin. Werger û tefsîra naverokê li gora bext û 'ilmê' wan bû. Wergera ku mamoste **Abdullah Varli** kir ev pirs jî ji holê rakir. Vê keliyê her kesê bixwaze bizanê ka çi di Qur'anê de heye dikare rastûrê li Qur'ana "bi Kurdî" binêre. Kalîteya weşanê bi awayekî rêkûpêk hatiye amade kirin. Paqîj û bedew hatiye çap kirin. Kêmasiya wê wergerê ku heye di warê ziman de ye. Şaşiyên rastnivîsînê li gelek ciyan xuya dikin. Hêvî ew e ku di çapa pêşerojê de ev şaşî jî bêne rast kirin. Ji vê navnîşanê Qur'anê dikare bê xwestin: **A. Varli, Menekşe Sok. No. 20/120 - Ankara**

AGAHDARÎ

Di hejmara pêşerojê de ewê li ser Koma Tiyatroya Elegezê agahdarî bê nivîsin.

GAZIN, PIRS Û DAXWAZEK

Neteweyê Kurd di har alî de di têkoşîneke dijwar de ye. Çanda wî, dîroka wî, ola wî, bi kurtî hebûna wî tê xwestin ku hunda bibe. Ew neteweyê ku zimanê wî, çanda wî, orf û adedên wî hunda dibin, bi xwe jî mahkûmê nemanê ye. Ji ber vê sedemê, divê em kurd, bi hemû hêza xwe li van tiştên xwe yê giranbiha xwedî derkevin. Dîrok û çanda me kevn û zengîn in. Ji me re serbilindî ne ku em xwedî wê kevnahiyê ne. Welatê me kaniya çand, ol û zimanên cihê ye. Ka ji vê tiştêkî bi rûmettir? Zengîniyek weha li ku heye? Divê em dîroka xwe, adedên xwe, zimanê xwe hîn bibin. Zengîniyên cihê li welatê me hêja ne ku em pê bizanibin. Çiqasî em xwedî zanîna van tiştên xwe bin ewê roja azadiya me jî hewqasî nêzîktir bibe. Bê goman, pîrsa herî girîng zimanê me ye. Zimanê Kurdî! Li gelek ciyan û di gelek rewşan de kes hene ku di axaftin, gengaşî (munaqeshe), xwendin û nivîsandinê de ji Kurdî direvin. Bi zimanên Tirkî, Erebî û Parsî diaxivin û dinivîsin. Xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî ji xwe re giran dibînin! Serê xwe jî naêşînin ku ew xwendin û nivîsandina Kurdî hîn bibin. Lê ev şaşiyê gelekî mezin û xeter e. Divê em vê astengê ji ber xwe rakin û bi serbilindî bi zimanê xwe bijîn. Bîr û bawerî, axaftin û nivîsandin, xwendin û raman kirin divê bi zimanê Kurdî be. Jiyana ne bi Kurdî mîna xwarîneke bê xwe û tahl e. Pirtûk, kovar, rojname û weşanên bi zimanê Kurdî bistînin û bixwînin! Xweşî ew e.

'KURDISTAN DI DEMA NUJEN DE'

Wezîrê EŞO

Bi vê sernivîsê, **Navenda Lêkolînên Kurdî li Moskovayê** berevok, angoyî pirtûkek weşand.

Ji we re me di **agahdariya** pêşîn de gotibû ku ev xebata wê navendê ya pêşîn e ku tê weşandin. Nivîsên berevokê pêşkêşî pîrsgirêkên têkoşîna Kurdan ya neteweyî ye...

Berpirsiyarê vê xebata kollektîf, ku bi destên Kurdzanên Rusyayê yê bi navê deng hatiye pêkanîn, **Prof. Şekiroyê Mihoyî** ye.

Nivîsara **Prof. M. Hasratyan** bûye beşa sêyemîn û bi vê sernivîsê di derheqê rewşa Kurdistanê ya zemanê niha ya politîk de û dora rewşa têkoşîna Kurdan ya neteweyî di nava 20/30 salên dawî de ye.

Nivîsarên berevokê bi curê beşan hatine weşandin, ji bo ku tiştê tomerî di nava wan de ew e ku ew hemû jî di derheqê gelê Kurd û Kurdistanê de ne.

Beşê pêşîn bi destê **Prof. M. Lazarev** bi sernivîsa **'Pîrsa Kurdan, Pêşdeketin, Pêşveçûn û Rewşa Niha'** di berevokê de hatiye weşandin.

Beşê berevokê yê duyemîn weha hatiye bi nav kirin: **'Kurdên Iraqê Li Ser Xwe Biryarkirin'**.

Beşê berevokê yê çarê **'Kurdîstana Îranê Di Dewleta Îslamî de'** jî aliyê **Dr. O. Jîgalînyê** hatiye nivîsandin.

'Di zemanê Niha de Faktora Kurdî li Suriyê' sernivîsa beşê paşîn e ku xwedanê wê **Dr. A. Bagîrov** e.

Di dawîya berevokê de xwedanên nivîsaran li ser bîngeha lêgerînên zanyarî yê heralî û kûr, yê rewşa her çar parçeyên Kurdistanê di nava çend salên paşîn de vî fikrê tomarî, giştî daxuyanî dikin:

'... Pîrsgirêka Kurdan bi zora çekan nîkarê bê safî kirin: Weke ku praktîkê nîşan da, ne mecal û ne îmkânên bi çapa mezin, yê zordariyê dijî Kurda, ne koçber kirin, ne kirinên teybetî yê nîjadkujiyê ne gihandin hundabûna pîrsgirêka Kurdan ya neteweyî. Eger wisa ye, rêya rast ya yek bi tenê ya safî kirina wê pîrsê hesab dide qeîde kirina heqiyê û demokrasîyê...'

Pirtûk di demekê nêz de ewê bi zimanê Kurdî jî bê weşandin.

Di hejmara pêş me de:

Nasandina weşanên Kurdên Sovyeta Berê!

KEŞE Û ZILAMEK

Wergêr: Ejder

Zilamek bi rê ve diçû û li pêş, wî jî keşeyek bi rêya xwe de diçû.

Zilamê me bi lez û bez xwe gihande keşê.

- Rojbaş Babo...

- Rojbaş... Rojbaş...

Keşê jê pirsî:

- Tu bi ku ve diçe lawooo?

- Babo, ez diçime bajarê Ximelno...

- Ji bo çi lawooo?

- Dibêjin ku li wê derê hespekî firotinê heye...

- Xêr e... Ma qey tu bê hesp î?

- Ezbenî, hespê min hebû, lê mixabin guran ew xwar.

- Haaa! Ev nûçeyek ne baş bû.

Keşê û zilam bi rêya xwe ve diçûn, ji nişkê ve awiran wan li tûrekî ket.

- Babo, diyar e ku mirovekî perîşan ev tûr winda kiriye.

Her du ber bi tûr ve çûn. Keşê got:

- Ma tu çi dibêje? Tiştê ku di tûr de, emê bi nêvî li hev par bikin.

- Helbet babo, heke perçekî nan jî tê de hebe emê li hev par bikin.

Devê tûr vekirin, çavên wan li berazekî qewirandî (di nav rûn de qelandî) ket:

Keşê şah bû û ji zilam re got:

- Lawooo!

- Çi ye babooo?

- Ne hêja ye ku em vî berazî li hev par bikin.

- Tu çi dibêjî babo? Kê pêşî dît, beraz wê para wî be...

- Keşê lê vegerand:

- Niha ji me tê xwestin ku em şeva xwe li vê daristanê biqedînin. Em vî berazî parve nakin. Emê razin û bi xêr sibehî her yek wê xewna xwe bêje, beraz wê bibê para wî kesê ku xewna wî baştir be.

Keşê û zilam agirê li pêşiya xwe vemirandin û cihê xwe amade kirin da ku razin. Zilamê me weke her gav û her wekî pîrr ne westiya bû, rabû ser xwe, çû û hat.

Lê keşê pîrr westiya bû. Kêliyê derbas bû û keşê me kete xewa şêrîn de.

Ti goman li cem zilam nema ku keşê ne di xewa şêrîn û giran de ye. Rabû, destê xwe avête tûr û berazê qewirandî ji tûr derxist û dest bi xwarinê kir.

Zilamê me têr xwar û serê xwe danî û kete xewa şêrîn de. Êdî têr e, ne xem e ku xewnan bibîne yan jî nebîne.

Serê sibehê her du ji xewê şiyar bûn, keşê ji zilam re got:

- Lawo, de ka bêje, şeva bihurî te çi di xewna xwe de dît?

- Ez nizanî Babo, destpêkê tu bêje, bê ka te çi di xewna xwe de dît, divê ezê bêjim.

- Baş e, ezê xewna xwe bêjim...

Zilam di ber xwe de kenîya û got:

- Wilo rast e Babo û xuya ye beraz jî wê para te be.

Keşê:

- Belê, belê, xewna kê baştir be beraz jî wê

yê wî be.

- De ka bêje Babo ma te çi dît?

Babo dest pê kir û got:

- Belê lawo, di xewna min de, min pêpelûkek dît, ew pêpelûk ber bi esmanê dawî ve diçû. Ez bi pêpelûkê ve hilkişiyam û hilkişiyam, ta ku ez gihame esmanê hefta. Li wêderê, Xwedayê mezin, goştê mirîşka û qazan û berazan pêşkêşî min kir. Min xwar û xwar, ta ku di qirika min re derket.

- Babo, xewna te baş e... Zilam dibêje. Ez jî şiyar bûm, min dît ku tu bi pêpelûkan ve hilkişiya û ez jî bi dizîka li pey te hilkişiyam. Xwedê gazî te kir û têra te xwarin da te, min jî nêrî û nêrî... Lê belê Xweda qet guh neda min. Hema bi lez, ez bi pêpelûkan ve ber bi jêr daketim. Min rahişte tûr û berazê qewirandî jê der xist û min têra xwe xwar.

Keşê qîr da û bi hêrs got:

- Lawo, ez bi rastî ne çûme esmana...

- Babo, tu çûbe ne çûbe, beraz çû.

Keşê reben bawer nekîr, destên xwe avête tûr, lê tûr valabû.

CÎHANA STRANBÊJÊN JIN

Sêrgo

Her cara ku ez li cîhana strana Kurdî dizivîrim, her tim dengên dengbêjên mêran tîn bîra min. Gava ku ez ji xwe dipirsim "kanî dengbêjên jin?" mixabin ji dengên jinan heta niha tu hunerên stranî wilo balkêş çê nebûye. Ji bo min, stranvaniya jinan ku li ber dest, di bingehêkî pîrr qels û bêkêre de ye. Li vir ez dikarim bi bîr bînim, **Meryem Xan, Eyşe Şan, gulbehar, Esfîka Qadir, Zafîna Şekir...** Gava ku em li ser van dengên rawestînin, em avaniyek heyî baş di nava wan de dibînin. Ew, ev ziravbûn û tujîtiya ku bi ahengên xwe li koka girîn, lorîn û feryad û fiğan der tê... Lê ji bo van salên dawîn, dengbêjiya jina Kurd, ji min re cuda tê... Li gora nivîsê ku me li jor nîşan kir... Dengê stranbêjên jin, îro, ji min re ferehtir, vekirîtir û stûrtir tê darî çavan. Eger ez ne şaş bim, girêdanek vê dabaşê bi ahenga politîk re heye û li vir ezê bêhtir bidim ber ronahiyê û bêjim ku ev tişt, li bakur û başûrê piçûk rast e. Di dengên stranbêjên jin yê berê de marş, stranên tund yan bi hêz peyda ne dibûn. Lê, li vir ez dixwazim tiştêkî bi bîr bînim. Ev jî, ew e ku hin dayik, pîrik û keçên Kurdan awazên resen têr wateî û afironekên heta ez karim bêjim ku heger lêgerîneke ciddî lê bê kirin. Hingî wê kaniyeke zelal, kur, bêhempa, bê vedîtin. Wekî nimûne ew awazên ku keç dibêjin gava xêlî tîn bûkê dibin, yan ew stranên li ser kesekî mirî, yan yarekê, ji ber çav windayî.

BERPIRSIYARIYA TELEVÎZYONÊ

Îlhan KIZILHAN

Televîzyon jî weke haletên din yê medya ye, ku dixwazin agahdar bikin û bi teybetî dixwazin bandora xwe li ser komên xelkê bikin. Lewra, di cenga cîhanê ya duyemîn de medya dest pê kir û bû parçeyek ji cenga bangeşiya dewletan û hêzên şer. Di vî demê de jî leşkeriya Ingilîstan bi derxistina belavokên bangêşiyê dijî Elmanyayê dest pê kir û bi balafirên **Royal Air Force**, li ser Elmania belav dikir. Bi vî azîna nuh dixwestin moral û hestê leşkeriya Elmania bişikînin û gel pasîf bikin. Bi pêşveçûna teknîkî, dewleta Amerika bû pîsporê medya û teybetî azînen nuh yê bangêşiyê afirandin û heta di şerrê hin welatan de jî bi kar anî. Bi afirandina vî teknîka nuh Amerika bi ser ket ku ew nûçeyên ne rast û subjektîf weka objektîf û rast belav dikir... Wê li dewletên Ewropa, bi teybetî li Fransa, Spanya, Elmania û Îtalya navendên nûçeyan vekir. Di resmîyetê de ew weha ava kirin ku ti elaqetê wan navendan bi Amerika re nîne. Weha jî ew navend objektîf dihatin xuya kirin. Ji bo wê projeyê 10 milyon \$ mesref hatin kirin. Karê wan navendan ew bû ku ew nûçeyên ne rast û subjektîf li ser hin têkoşinan belav bikin. Taktîka wan navendan belavkirina desinformasyonê bû. Rojname û kovarên mezin, mîna **New York Times, Washington Post, Los Angeles Times** û hwd. ji van navendan nûçe distendin û belav dikirin. Bi vî yekê elaqetê resmî yê Amerika bi van nûçeyan ve nebû. Ji ber sedema ev nûçe ji "navendên Ewropa têne stendin" objektîf xuya dikirin. Îro ev teknîka televîzyonê û internet (compuserve, world wide web...) weha pêş ketiye ku merov dijwariyê dikşîne ku agahdariyên rast û ne rast ji hev cihê bike. Medya li Tirkiye ji rejîma Tirkiye re kar dîke û her derfetên xwe dijî şert û şurûtên şerefa rojnamevaniyê û objektîvîzmê derdikevin. Televîzyon ne tenê agahdarian dide. Ew di her hêlî de, ango kovevanî, ramiyarî, civatî, çandî, dîrokî, hunermendî û hwd. gelan perwerde dîke. Di sala 1992 de, di lêkolînekê de tê xuya kirin ku zarokên Elman di ceribandinekê de filmekî negatîf li ser Kurdan dibînin, tenê 30,3 % ji wan azadiya Kurdan dixwazin. Komeke din ya zarokan filmekî din li ser Kurdan dibînin. Ew film pozîtîf e. Ji vî koma zarokan 85,6 % azadiya Kurdan dixwazin. Medya, bi teybetî televîzyon haletêkî weke bombeyêke bê deng e. Ji ber ku medya bû ye çavên merovan, ku merov dikarê cîhana nêz û dûr bibîne, bibihîze... Televîzyona Kurdî, MED/TV ji meha Gulana 1995 û vir de dest bi weşana xwe kiriye. Ew pêwîstiyek bû û divê bi zanistî û menfaetê hebûna neteweyê Kurdî pêş ve herê... Ev karekî giran e. Berpirsiyariyê mezin e... Nivîskarê mezin **B. Brecht** dibêje: 'Ne pêwîst e merov pêşkêfî be, divê ku merov pêş ve here...'

agahdari

Weşana
Enstituya Kurdî
Ya Brukselê

Berpirsiyar: Medenî FERHO
Redaksiyon: Kerîm Baqustanî
Wezîrê Eşo - Ejder Mehemed

Navnîşan:
Bonneelsstraat, 16 - 1210 Bruksel
Tel. 02. 230 89 30, Fax 02. 230 34 02

Nivîskar
berpirsiyarên
nivîsên xwe ne